# Banga ji bo beşdarî û hevkariyan

## ji bo sîmpoziyûma online

**"Dekolonîzekirina zanîn û zanistê:
Şikandina tecrîdê û hûnandina piştgiriyê
bi zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî / Rojava re"**

**Tevlî yekê ji komên xebatê bibe,
civîna yekem a komên xebatê
13`ê Mijdarê saet 19.00`an
e li gorî saeta Rojava**

Tekilî: csua.paris@gmail.com

**Organîzator:** Zanîngehên li Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrî, Navenda Piştgiriyê bi Zanîngehên Alternatîf re (CSUA), Kurd Akad.

Di van demên krîzên civakî, siyasî, aborî û ekolojîk de û di vî çaxê otorîteryanîzma zêde dibe û newekheviyên pirrtebeqeyî li seranserê dinyayê de zanîngeh divê bibin pêşengên veguherîn, înternasyonalîzm û edaleta kurewî. Gelek gotarên zanistî yên li ser dekolonîzekirina zanîn û zanîngehan bala xwe esasî didin ser meseleyên teorîk, û ew avahiyên madî, mekanên bîreweriya muxalif, zilm, teorî û helwêstên rexneyî yên ji bo azadiyê di nava şerên neokoloniyal de, qirkirinên hawîrdorê, yên miletan û yên jinan, bêmilkkirin û avahiyên nû yên jeopolîtîk nabînin.
Sîmpoziyûm, dekolonîzekirina zanînê vedigerîne kokên têkoşînên ku armanca wan avakirina civakên ku xwe bi xwe birêxistin dikin û demokratîk in.

Sîmpoziyûm bi dekolonîzekirina zanînê ya tevgera Kurd û têkoşînên azadiyê dest pê dike. Van tevger û têkoşîn bi armanca avakirina civakên ku xwe bi xwe bi rêxistin dikin û demokratîk in, ev dekolonîzekirina zanînê bi pêş xistin. Nexasim li Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrî ya ku Rojavaya dîrokî jî dihewîne, zanîngehên hatine avakirin, beşdarker û demokratîk in di mijar, metodolojî û avahiyên xwe yên rêxistinî de. Bi awayekî nû û nûker, saziyên akademîk ên li Bakur û Rojhilatê Sûrî teorî û pratîkê bi hev ve dikin. Ew vê dikin, weke zanyarên aktîvîst ji bo pêvajoyên giştî yên civakî yên azadî û xweseriyê bi rêya azadiya jinan, ekolojiya bi sihet, û demokrasiya li zemîn. Ev zanyarên azadîxwaz her wiha hewl didin tifaqan ava bikin bi tevgerên femînîst, antîkoloniyal, antîîmperyalîst, antîkapîtalîst ji bo avakirina koalîsyonên berfirehtir ên gelêrî li dijî otorîtaryanîzma rasgiriya tundraw, siyasetên jixwekêmkirina eskerîkirî, xizaniya înterseksiyonal û mêhtingeriya li ser avhewayê. Li Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrî mêhtingerî weke bombeyên bi ser wan de dibarin bi rastî ye. Meseleya dekolonîzekirinê jî betalkirina vê mêhtingeriyê ye. Ji ber wê yekê jî pratîka betalkirina mêhtingeriyê jî divê ne tenê gotin û peyv bin; divê ji minaqeşeya xwerû akademîk û wêde biçe. Rewşa heyî bang li me dike ku em piştgiriyê di pratîkê de nîşan bidin, û bi aktîvîzma siyasî jî li dijî êriş û hovîtiyên dewleta Tirk ên li dijî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û zanîngehên wê rabin; her wiha ji bo ku em li ber wan tedbîr û zextan jî rabin ku naskirin û qebûla Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û zanîngehên wê û şiyanên wê yên hevkariyê asteng dikin. Nasnekirina dîplomayên zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî parçeyek jî tecrîdkirina Rojava ye. Ev yek, yekser girêdayî nîzama koloniyalîst a dinyayê ye.
Formata giştî ya Sîmpoziyûmê û naveroka wê dixwaze piştgiriya me bi hev re, bi têkoşînên ji bo veguherînên demokratîk, û bi xizmeta ji bo civakê re nîşan bide. Sîmpoziyûm, gotarên dekolonîzekirina zanînê yên Ewrûpî/navend-Ewrûpî nadeyne pêş, li şûna wê, ew ê cih bide wan perspektîf, teorî û pratîkên li zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî yên ku alternatîfan li hember awayên kolonyal ên zanînê bi pêş dixin; bi vê yekê jî ew li seranserê dinyayê îlhamê didin mirovan.
Piştî civîneke serketî ya diyalogê di Gulana 2024'an de ev Sîmpoziyûm dixwaze avahiyên tevnên karîger û avahiyên karkirinê ji bo hevkariya navneteweyî ava bike. Armanca vê yekê, xurtkirina piştgirî û alîkariya ji bo zanîngehên alternatîf ên li Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrî û projeya wan a damezrêner a Dekolonîzekirina Zanîn û Zanistê ye. Di peywenda heyî de heyatî ye ku em tecrîdkirina bi destê dewleta Tirk û aktorên din ên împeryalîst a zanîngehên Rojava bişikînin û her wiha lazim e ku em avahiyên hêzê yên sîstema akademîk a kurewî tevî şideta wê ya jeopolîtîk, nijadperest, cinsiyetperest û epîstemîk jî bişikînin.

## Alîkariyia we ji bo komên xebatê

Em bang li we dikin ku bi alîkarî û piştgiriya xwe hûn tevlî vê sîmpoziyûmê bibin. Bername wê ji pêşkêşkirina gotarên ferdî pêk neyê; li şûna wê em bang li we dikin ku hûn tevlî civînên komên me yên xebatê yên li jêr bibin:

- Hevkariya navneteweyî ya dersdayînê
- Hevkariya navneteweyî ya lêkolînê
- Xwegihandina çavkaniyan û ekîpmanan a zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî
- Wergerandina metnên perwerdeyî
- Naskirin û qebûla Zanîngehên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrî

**1. Hevkariya navneteweyî ya dersdayînê**
Dersdar û doçentên ji gelek zanîngehên Ewrûpî, Asyewî, Bakur û Başûrê Emerîkayê bi zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî re bi awayên cihê hin peywendî danîn. Bi gelek zanîngehan re hin hevkarî hatin kirin; zanîngeha havînê, dersên hevpar hatin lidarxistin, dersdarên wan li Rojava û yên Rojava li zanîngehên wan bûn dersdarên mêvan. Hin awayên din ên hevkariya perwerdeyî jî dewam dikin. Lê belê divê hîna gelek kar were kirin. Koma Xebatê ya Hevkariya Navneteweyî ya Dersdayînê dixwaze bi zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî re bixebite da ku derfetê bide pevguherîna tecrûbeyên hevkariyên heyî, mekan û babetên nû yên dersdayîna bi hevkariyê û formatên nû yên hînbûna bi hevkariyê nas bike. Ev ê li zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî şiyan û karînên dersdayînê xurt bike.

**2. Hevkariya navneteweyî ya lêkolînê**
Hevkariya navneteweyî ya lêkolînê di navbera zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî û saziyên akademîk û lêkolînê yên dinyayê de heta niha kêm maye, nekariye potensiyala tam a pêkhênerên zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî derxe holê. Çend sîmpoziyûmên navneteweyî yên lêkolînê bi derfetên kêm yên zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî hatin lidarxistin û belavkirina encamên wan sînordar bû. Bi her halî projeyên lêkolînê yên ku fakulte û xwendekarên wan bi rê ve dibin, hene. Û pêdiviya wan hîna heye ku agahiyan li ser lêkolîna dixwazin di demên pêş de bikin, berhev bikin û awayên cihê yên hevkariyan hene ku ew dixwazin ava bikin. Divê bersiva pirsên elaqedarî danîna lêkolînê (mijarên lêkolînê, beşdar, fînansman û hêmanên din) bi lêkolerên li Rojava re were dayîn û projeyên lêkolînê divê mijarên cihêcih, herêmî û pêdiviyên gelên Bakur û Rojhilatê Sûrî li pêş bigirin. Rêbazên weke lêkolîna Çalakiya Beşdarker dibe ku derfetê biafirîne ji bo minaqeşe were kirin li ser projeyên hevpar ên siberojê bi awayekî ne hiyerarşîk û bi armanca peydakirin/dabînkirina zanînê ji bo komên/civakên bindest. Wekî din jî muhim e ku lêkolerên kurdîaxêv ên li seranserê dinyayê beşdar bibin li nava bernameyên cihê yên lêkolînê. Bi hevkariya bi zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî re, Koma Xebatê ya Hevkariya navneteweyî ya lêkolînê wê bixebite da ku pêdiviyên lêkolînê nas bike, û tevneke lêkolînê ya navneteweyî ava bike ya ku nexasim pispor be di berjewendiyên tavilê yên zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî de lê her wiha pispor be ji bo berjewendiyên giştî yên gelên Bakur û Rojhilatê Sûrî. Ev înîsiyatîf wê di heman demê de ji xwe re bike armanc ku bernameyên akademîk ên lêkolînê yên heyî werin dewlemendkirin.

**3. Xwegihandina çavkanî û ekîpmanan a zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî**
Kalîteya binesaziya fizîkî û dijîtal heyatî ye ji bo ku xwendekar xwe qeyd bikin û xwendina xwe bibin serî. Bi her halî, ji bilî kêmbûna dersxaneyên bi ekîpmanên dijîtal, labaratuwarên zanistî û pirtûkxaneyên berfireh, binesaziya Teknolojiyên Ragihandinê li zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî gelekî sînordar e ji ber nebûna binesaziya teknîkî ya lazim û nebûna çavkaniyan. Xwendekar tenê dikarin sûdê ji amûrên pirr kêm ên dijîtal sûdê wergirin. Ji bo ku karibin bêhtir xwendekarên bi motîvasyon ber bi xwe ve bikişînin, xewgehên xwendekaran û tiştên nava malê yên weke mekîneyên cilşûştinê û firaxên midbexê jî kêm in. Bi hevkariya rêveberiyên zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî, Koma Xebatê ya Xwegihandina çavkanî û ekîpmanan wê lîsteyeke pêdiviyên taybet amade bike û nexşerêyekê pêşniyaz bike da ku rê werin naskirin ji bo dabînkirina van pêdiviyan di mohleta kurt û navîn de

**4. Wergerandina metnên perwerdeyî**
Kêmbûna materyal û metnên perwerdeyî û pedagojîk bi zimanê Kurdî yek ji zehmetiyên herî mezin ên zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî ye, nexasim di warê dana xwendekaran a zanîneke berfireh di her beşê xwendinê de. Divê bêhtir wergêr û fînansman werin organîzekirin da ku kitêbên dersan û xebatên din ên zanistî li Kurdî werin wergerandin. Koma Xebatê ya Wergerandina Metnên Perwerdeyî wê bi zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî re hevkariyê bike da ku hejmareke baş a çavkaniyan li gorî mijarên wan ên li pêş wergerînin Kurdî. Hawizekî çavkaniyên perwerdeyî ya bi xwegihandina dijîtal jî dikare di çarçoveya pirtûkxaneyên zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî de were damezirandin.

**5. Naskirin û qebûla Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî**
Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî bang li saziyên akademîk ên seranserê dinyayê dikin ji bo piştgirî û desteka li têkoşîna wan a ji bo naskirin û qebûla wan di siberojê de. Hin zanîngehên ji seranserê

dinyayê Memorandûmên Lihevkirinê û hin peymanên piştgiriyê (sermeselê, Dibistana bilind a Emden Leer, Dibistana Bilind a Alice Salamon a Berlînê, Zanîngeha Bremenê, Zanîngeha Humboldtê) îmzekirin bi zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî re. Gavên din jî dikarin werin avêtin di meseleya naskirin û qebûlkirina dîplomayên zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî de; sermeselê bi awayê serpereştiya navneteweyî ya hevpar a Bernameyên Tezên Masterê û yên Doktorayê. Bernameyên daimî yên hevpar jî dikarin werin damezirandin. Ev nimûne dikarin hinên din jî teşwîq bikin; bi her halî pêdiviyeke lezgîn heye bi destpêkirina kampanyayeke global ji bo naskirina zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî û hevkariya mayînde ya bi rêxistinên akademîk û ên lêkolînê yên li seranserê dinyayê re. Her hevkarî wê her wiha bîreweriya li ser xisletên modela Rojava û saziyên wê jî zêde bike. Ev koma xebatê wê avahî, motîf û hêmanên kampanyaya kurewî ya muhtemel nas bike. Ev kampanya jî dibe ku rê veke li ber qebûla fermî ya zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrî.

Bi danîna gotaran a li ser zemînê komên xebatê, yên ku wê beriya sîmpoziyûmê dest bi civînên xwe bikin, armanca me ew e ku em bala bername û minaqeşeyan bidin aliyê pratîkî. Em bang li we dikin da ku hûn tecrûbeyên xwe yên teorîk û pratîk, fikrên li ser bipêşxistina yek yan jî bêhtir komên xebatê û pêşandana wan di sîmpoziyûmê de parve bikin û bi wê yekê piştgiriya xwe û desteka xwe nîşan bidin.
Sîmpozyûm wê online were lidarxistin û îhtîmal heye ku li hin mekanên fizîkî bi awayekî hîbrîd/melez jî bi rê ve biçe.

**Dem: 20'ê Sibata 2025'an**
**Saet: Ji saet 12:00'an heta bi 20:00'an (yên Rojava û Sûrî)**

Em bang dikin li akademîsyen, çalakger, hunermend, rewşenbîr, înternasyonalîstan da ku beşdar bibin li vê sîmpozyûmê û/yan jî bibin parçeyek ji tevna navneteweyî û dekoloniyal ya ku diberide û her xurttir dibe.

Peyamekê bişînin ji csua.paris@gmail.com re. Di vê peyamê de îşaret bikin bi elaqeya xwe ya beşdariya/desteka sîmpoziyûmê û komeke xebatê; beşên xwe yên hûn li ser ser dixebitin; û hin agahiyên li ser paşxaneya xwe ya şexsî. Vê peyamê beriya civîna me ya Komên Xebatê ya 13. Mijdara 2024'an seet 19:00'an (saeta Rojava û Sûrî) bişînin.

**Vî qewlî ji bîr meke – 13`ê Mijdarê, li gorî dema Rojava saet 19.00`an – û tevlî komên xebatê bibe.**

Her kesa ku dixwaze agahdar bibe û bibe beşek ji avahiya me ya ragihandinê jî cihê wê li ser çavên me heye da ku beşdarî lîsteya me ya e-mailê bibe.

Ji kerama xwe peywendiyê bi me re deynin: **csua.paris@gmail.com**

**Organîzator:**
**Zanîngehên li Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrî, Navenda Piştgiriyê bi Zanîngehên Alternatîf re (CSUA), Kurd Akad.**

ZANÎNGEHA ROJAVA
2016
CENTER FOR SOLIDARITY WITH ALTERNATIVE UNIVERSITIES
CSAU
Zanîngeha ŞERQ جامعة الشرق
UNIVERSITY OF KOBANI ZANÎNGEHA KOBANIYÊ
2017
KURD-AKAD
Tora Akademîsyenên Kurd
Network of Kurdish Professionals
Netzwerk kurdischer AkademikerInnen